Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1025 | 25-Kanûn- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165

## Radyoya Erîvanê; dengê ji dûr ve

**Hunermenda Ermen Larissa Araz bi xebata xwe ya li ser deng a bi navê "Voice from awar" kesên ku li Radyoya Erîvanê guhdar kirine xeyal kiriye û rola radyoyê ya ji bo civaka Kurd nirxandiye. Xebata wê ya bi deng xebateke balkêş e û meriv dibe wan salan.**



Hunermenda Ermen ya bi navê Larissa Araz bi xebata xwe ya "Voice from awar" (Dengê ji dûr ve) li ser xebatên Radyoya Erîvanê yên Kurdî hûr dibe. Ev xebata wê tenê li ser deng e, wê bi dengên stranan lîstiye û berhemeke li ser dengî afirandiye. Ev xebata wê li Zûrîhê, li platforma dîjîtal a "Oto Sound Museum" tê nîşandan. Xelk dikarin heta 30'ê Berfanbarê herin li wir guh bidin xebata Larissa Arazê. Her wiha saziya bi navê SAHA jî piştevaniya xebata Larissa Araz dike.

Piştî ku Radyoya Erîvanê di sala 1955'an de dest bi weşanê kiribû, dengê wê li seranserê Kurdistanê bilind bûbû û radyo ji bo çand û hunera Kurdî bûbû palpiştek qewî. Kilamên ku li vê radyoyê hatin gotin di heman demê de nasnameya Kurdî jî berbiçav dikirin. Larissa Araz jî li ser frekansên deng fikiriye û xebata wê jî xebateke razber e. Ew li ser kesên ku li vê radyoyê guhdar kirine disekine û bi dengê ku hazir kiriye li guhdaran difikire. Yanî wê ji radyoyê bêhtir bala xwe daye ser dengên radyoyê, frekans û guhdaran. Kesên ku bi awayekî çalak li vê radyoyê guhdar kirine xeyal dike. Ji bo vî karê xwe jî ji arşîvên mala Celîl sûd wergirtiye. Dema meriv li dengê ku Larissayê hazir kiriye guhdar dike, meriv bivênevê li ser wan zemanan difikire û dengê wê jî meriv dibe cihên dûr...



### Kesen li radyoyê guhdar kirine xeyal dike

Dengê ku Larissa Araz weke enstalasyonekê hazir kiriye li ser malpera "soundcloud" jî hatiye parve kirin. Li bin dengê hatiye parvekirin şiroveyeke bi vî rengî jî heye; "Radyoya Erîvanê bandoreke mezin li civaka Kurd kiriye. Nexasim jî di navbera salên 1960 û 1980'an de peywireke baş bi cih aniye. Dengên ku ji radyoyê hatine bihîstin sînoran derbas kiriye û nasnameyekî nû ava kiriye ji bo Kurdan. Li herêmên Kurdan radyoyên destan gelek bûn û Radyoya Erîvanê bi saya wan li Kurdistanê hatibû naskirin û dengê wê li her derî belav bû. Xebata bi navê "Voie from awar" ji radyoyê bêhtir li ser kesên ku li radyoyê guhdar kirine disekine. Ev proje van dengan bi awayekî razber nirxandiye û xwestiye wan kesên ku li radyoyê guhdar kirine xeyal bike."

### Pirsgirêkên îfade û azadiyê dewam in

Larissa Araz bi saya dengên Radyoya Erîvanê behsa pêkûtiyên li ser çandê jî dike. Xebatên bi vî rengî weke berxwedenake çandî dinirxîne. Ji xwe wê bi vê xebata xwe xwestiye atmosfereke fizîkî û derûnî ava bike. Her wiha di dewamiye şiroveya li bin dengî hatiye parvekirin de ev derbirîn jî hene; "Xebata 'Dengê ji dûr ve' rola radyoyê ya wan salên berê şênber dike. Nexasim jî çanda ku bi qirkirinê re rû bi rû maye û kesên ku vê çandê parastine îşaret dike. Piştî xebatên arşîvê ev xebat bêhtir kemilî û bi halê dawî derket holê. Divê em ji bîr nekin îro jî di warê îfadeyê de pirsgirêk hene û azadiya hin civakan nayê qebûlkirin."

### Larissa Araz kî ye?

Di sala 1990'î de li Stenbolê hatiye dinyayê. Di sala 2010'an de li Zanîngeha New Yorkê di beşa "Medya, ragihandin û Çandê" de dest bi perwerdeyê kiriye û li Zanîngeha Koçê di beşa "hunerên bedew" de perwerdeya xwe ya lîsansê biriye serî. Larissa di gelek warên hunerî de berhem ava kirine; nivîs, deng, video û wêne çend hêlên sereke ne ku li ser wan sekiniye û di vî warî de afirandiye. Ew bi xebatên xwe dixwaze li ser hafizeya civakî bisekine û hin tiştên ku ji hêla dîroka fermî ve nayên qebûlkirin bide nîqaşkirin. Arşîv, dîrok û nasname ji bo wê girîng in û li pirsên ku bê bersiv hatine hiştin dikole. Dema vî tiştî dike ji bi nihêrîneke şexsî dike û afirîneriya xwe li van meseleyan zêde dike. Larissa rêvebirê "Înîsîyatîfa Hunermendan a Poşe" ye jî ya ku di sala 2018'an de hatiye ava kirin. *-Ozgurpolîtîka*

## Li Kobanê tabloyên 14 wênesazên jin hat pêşandan

**Sêyemîn pêşangeha şêwekariyê di bin navê Panoramaya Rojava bi 60 tabloyan destpê kir. Jinên şêwekar destnîşan kirin ku bi riya tabloyên xwe peyamên girîng didin.**

Navenda Çand û Hûnera Baqî Xido ya herêma Firatê sêyemîn pêşangeha şêwekariyê ya bi navê Panorama Rojava di bin diruşmeya "Rengên me ji çekên we bihêztir in" duh destpê kir. 14 şêwekarên jin ên şagirtên naveda Çand û Hûnera Baqî Xido ne bi 60 tabloyên cuda beşdarî pêşangehê bûn.

Di tabloyan de pêşengên Kurdan, dayîk û jinên Kurd, her wiha gelek mijarên girêdayî Kobanê weke mûzexane, koçberî û goristana Şehîd Dicle, xwezaya bêdeng hatin vegotin.

### 'Em berhemên şagirtên xwe nîşan didin'

Mamoste û rêveberiya beşa şêwekariyê Nûhan Cimo hurguliyên pêşangehê bilêv kir û wiha got: "Wêne beşekî girîng û bi wate ye di nava hûnerê de, ji ber vê divê xwedî lê were derketin. Mirov di nava vî beşî de dikare peyamên ku dixweze bi rengekî hêsan bîne ziman. Di xêzkirina tabloyekê de em dikarin bi hezaran tişt bigîhînin civaka xwe. Ji lewra lidarxistina pêşangehên şêwekariyê yên di vê astê de girîng in. Pêşengeha me ya salane ye û di dewreya xwe ya sêyemîn de ye, em bi riya vê pêşangehê berhemên şagirtên navenda Çand û Hûnera Baqî Xido ji gelê xwe re pêşkêş dikin. Li ser vê bingehê me navê pêşangehê kir Panoramaya Rojava, ji ber ku di nava xwe de gelek mijaran û peyaman digre. Dirûşmeya pêşangehê jî, girêdayî rewşa ku em niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin e."

### 'Ez bi tabloyên xwe piştgirya jinên Rojhilatê Kurdistanê dikim'



Di pêşengehê de reng, hest û hûnera jinan bi rengekî diyar li pêş bû. Mirov çiqasî çavên xwe bigerîne, wê rastî tabloyeke girêdayî jin were. Di nava tabloyan de, şêwekarekê wêneya Jîna Emînî ku li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê polîsên exlaqê yê dewleta Îranê ve hat qetilkirin û ev sê meh in ji ber vê bûyerê jinên Rojhilat di nava serhildanan de ne, hatibû xêzkirin. Pêşangeha ku duh destpê kir dê sê rojan bidome.
*-JîNHA*

### Sudoku:Pirs 35

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 4 | 2 | | | 1 |
| | 7 | | | | | | 3 | |
| 5 | 6 | | | 3 | 7 | | 2 | |
| | | 2 | 5 | | 8 | 1 | | |
| | 9 | | | 1 | | | 4 | |
| | | 6 | 4 | | 9 | 5 | | |
| | 5 | | 1 | 8 | | | 9 | 6 |
| | 4 | | | | | | 1 | |
| 1 | | | 7 | 6 | | | | |

### Sudoku: Bersiv 34

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 7 | 3 | 6 | 2 | 1 | 5 | 8 | 9 |
| 2 | 9 | 1 | 8 | 4 | 5 | 6 | 7 | 3 |
| 5 | 6 | 8 | 7 | 3 | 9 | 4 | 2 | 1 |
| 3 | 4 | 5 | 9 | 1 | 2 | 7 | 6 | 8 |
| 7 | 8 | 9 | 4 | 6 | 3 | 2 | 1 | 5 |
| 6 | 1 | 2 | 5 | 7 | 8 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 2 | 4 | 3 | 8 | 7 | 1 | 5 | 6 |
| 8 | 3 | 7 | 1 | 5 | 6 | 9 | 4 | 2 |
| 1 | 5 | 6 | 2 | 9 | 4 | 8 | 3 | 7 |

### Quncika Têgînan

| Hêman | **Bingeh, hîm, xîm, esas. Bernameya xwe li ser hêmaneke xurt çêkiriye.** |
|---|---|
| Koalisyon (Fransî) | Yekîtiya ji çend hêzan pêk tê, rêveberiya hevbeş: Welat bi koalisyonê tê birêvebirin. Itîlaf. |
| Restore (Fransî) | Çêkirina deverên xerabûyî yên avayiyekê, Nûkirin: Keleha Elodîno hat restorekirin. |
| Rêgez. | Fikirê bingehî, baweriya bingehî. Prensîb, mebde: Rêxistineke xwedîrêgez e. Mirovekî xwedîrêgez e. |
| Stad/Stadyom (Fransî) | Ciyê lîstina taximan, ciyê pêşbirka lîstikên sporê, ciyê merasiman. Qad, sahe: Du taximên futbolê li stadyoma Qamişlo hatin hemberî hev. |
| Tîm (Ingilîzî) | Yekîneyeke futbolê û lîstikên din. Du tîmên futbolê hatin hemberî hev. Ferîq. |
| Turnuva (Fransî) | Rêzepêşbirkên bi dorê di navbera tîmên sporê de tên lidarxistin. Mûsabeqe. |
| Tûnel (Fransî) | Riya di bin erdê de, riya hawîrdorê wê girtî. Ji bo kurtkirina rê di çiyê de tûnelek hat vekirin. |
| Werziş | Spor. |
| Werzişvan | Kesê sporê dike. |



## HPG: Êrîşên Kîmyawî yên artêşa Tirk a dagirker dewam dikin

HPG'ê ragehand ku êrîşên Kîmyawî yên dagirkeriya Tirk yên ser qadên gerîla dewam dikin û got, artêşa Tirk a dagirker di 23'ê Kanûnê de 10 caran çeperên berxwedanê yên gerîla bi çekên kîmyewî bombebaran kir. ***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1025 | 25-Kanûn- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# KOMKUJIYA PARÎSÊ YA DUYEMÎN BERDEWAMIYA KOMKUJIYA YEKEMÎNE

Dîsa hat nîşandan ku êrîş, komkujî, qirkirina li hêmberê Kurdan û pêşengên wan, sînorê axa Kurdistanê, derbas kirine. Siyaseta tunekirinê ji aliyên hêzên dagirkerên weke dewleta Tirkiyê û hevalbendên wan, dîsa wek sala 2013'an, li navendên Ewropa, pir rehet tevdigerin û şoreşgerên Kurd, hedef digrin.



## KCK: Berpirsê qetlîamê desthilata AKP-MHP ye

KCK'ê qetlîama li Parîsê şermezar kir û got, berpirsê qetlîamê desthilata AKP-MHP ye, eger li ser Qetlîma 9'ê Çileyê nehatiba nixumandin îro ev qetlîam pêk nedihat, pêwîste gelê me û dostên wan bi awayekî demokratîk bertekên xwe nîşan bidin. ***R-5***




## Bi rêya komeke jinan alîkarî tê belav kirin



Bi armanca pêşxistina çanda alîkariyê di nava civakê de, herwiha alîkariya malbatên xizan û koçber, Komeke jinên bajarê Qamişlo dest bi insiyatîfeke mirovî û alîkariyî li bakurê rojhilatê Sûriyê kirin. ***R-2***

## Xebatên TEV ÇAND'a bakur û rojhilatê Sûrî yên salekê




Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamya li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê salekê di qadên Sînema, Şano, Mûzîk, Govend, Wênesazî û perwerdeyan de gavên pir girîng avêtin û encamên baş bidest xistin. ***R-7***


## Endamê YNK'ê: Parastina Rojavayê Kurdistanê, erkê me hemûyan e ***R-4***



Rûstem Başûr
**ÇIMA EWQAS TECRÎD?**
*R-6*



Idrîs Henan
**Tecrîd Teyisandina..**
*R-5*



Farûk Sakik
**Dîsa Parîs...**
*R-4*

# Bi rêya komeke jinan alîkarî tê belav kirin

Bi armanca pêşxistina çanda alîkariyê di nava civakê de, herwiha alîkariya malbatên xizan û koçber, Komeke jinên bajarê Qamişlo dest bi insiyatîfeke mirovî û alîkariyî li bakurê rojhilatê Sûriyê kirin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Înîsiyatîfa Jinên bajarê Qamişlo ji bo alîkariya hewcedaran û şadkirina dilê wan, herwiha pêşxistina çanda alîkariyê di nava civakê de ji du jinan gihîşt komeke jinan. Van jinan xwestin rihê mirovayî û heskirinê belav bikin û ji her kesên hewcedar re bibin alîkar. Ji bo wê jî dest bi hemleyeke alîkariyê kirin û bi tevayiya hewldanên û derfetên heyî ji civakê re dibin alîkar.

Alîkariya xizan û hewcedaran erkek e mirovî ye, lewra alîkarî ne ji bo hewcedaran tenê, ji bo xêrxwaz û alîkaran jî sûda wê pir heye. Ya herî girîng û balkêş jî ew e ku çanda alîkariyê û rihê mirovayiyê di nava civakê de belav dibe. Herwiha bi rêya hemle û isiyatîfên bi vî reng, nifşeke nû li ser bingehê wekhevî û hevgirtinê dê were avakirin.

Derbarê destpêkirina insiyatîfê ji aliyê komeke jinan ve û alîkariya civakê berpirsa insiyatîfê Sîham Ehmed ji me re axivî û da zanîn ku wê di demên pêş de gavên mezintir ji bo alîkariya civakê biavêjin.



**\`Armanc alîkariya civakê û belavkirina çanca alîkariyê ye\`**

Sîham bîr xist ku ne niha ji demek dirêj ve ew alîkariya civakê dikin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Wek jinên bajarê Qamişlo ji 2020\`an ve me dest bi vî karî kiriye û em alîkariya civaka xwe dikin. Heta niha jî berdewamiya karê xwe dikin. Destpêkê em du jin tenê bûn, hin bi hin jimara me zêde bû û me komeke xwe ava kir. Niha jî nêzî 20 jin di komê de dixebitin. Em bi hev re her demekê insiyatîfên alîkariyê li dar dixin. Armanca me ji vî karî alîkariya civakê û belavkirina çanca alîkariyê ye. Herî dawî em bi insiyatîfa alîkariya malbatên hewcedar ve rabûne û hê jî insiyatîfa me berdewam e.”

**\`Em bi gelek rengan alîkariyê dikin\`**

Sîham got, li gorî derfetên heyîn em alîkariyê didin hewcedaran. Destpêkê wek komîte em serdana malbatê dikin û li gorî rewşa wan em alîkariyê didin. Pîvana me ya alîkariyê ew e ku di malbatê de eger bav yan dê tinebin, yan jî kesek astengdar hebe herwiha kesên ku nexweşiyên giran bi wan re hebin, em alîkariya pereyan, yan pêdiviyên jiyanî yên ji wan re pêwîst pêşkêş dikin. Ji bilî pereyan em bi gelek rengan alîkariyê dikin, weke selikên xwarinê, dermanên nexweşan, cilên zarokan û gelek caran jî me goşt belav kiriye. Ji xwe di dema belvbûna nexweşiya korona de me şûşeyên oksîjenê jî belav kirin.

**\`Me xwest bi rêya insiyatîfê alîkariya hewcedaran bikin\`**

Sîham Ehmed behsa însiyatîfa wan ya niha kir û wiha got: “Weke jinên xwebexş ji ber şert û mercên dijwar yên ku herêm tê de derbas dibe, me xwest ku vê insiyatîfê bidin destpêkirin. Herwiha ji ber ku rewşa aborî ya gelek malbatan lawaze, me xwest ku bi rêya insiyatîfê alîkariya wan bikin û êş û azarên wan sivik bikin. Ji bo wê jî wek jinên xwebexş me hewl da tiştên pêwîst kom bikin û pêşkêşî malbatên hewcedar û koçber yên li herêmê bikin.”

**\`Em bi gelek insiyatîfên mirovî rabûne\`**

Sîham di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser insiyatîfên ku beriya niha pê ve rabûne û axaftina xwe wiha domand: “Berî niha em bi gelek insiyatîfên mirovî rabûne. Insiyatîfa yekem di bin navê \`Geşkirna dilê zarkanên\` dibistanan de, me porê 35 zarokan bê pere kur kir. Di insiyatîfa duyem de, me pêdiviyên xwendinê li xwendekarên dibistanan yên ku pêwîstiya wan bi alîkariyê hebû belav kirin. Li gel buhabûna kirtasî û pêdiviyên dibistanê, herwiha rewşa aborî ya zehet, me biryar da ku dest bi însiyatîfa \`Kêfxweşiya Xwendekaran\` bikin. Di vê insiyatîfê de me alîkariya 150 xwndekarî kir. Herwiha ji ber zêdebûna jimara xwendekaran me insiyatîfa xwe dirêj kir û alîkariya 50 xwendekarên din kir. Me pêdiviyên wan ji çente û kirtasiyan peyda kirin, da ku ev xwendekar bi dilxweşî xwendina



xwe berdewam bikin.”

**\`Em ê berdewamiya karê xwe bikin\`**

Sîham diyar kir ku ew û hevalên wê yên di komê de pir ji vî karî hes dikin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Tevayiya jinên di komê de Keyfa wan pir ji vî karî re tê. Çimkî dema em pêwîstiya kesekî peyda dikin û xweşî dixin dilê wan de pir pê kêfxweş dibin. Heta em saxbin emê berdewamiya karê xwe bikin. Lewra ev karekî miroxî ye û çanda me diparêze.”

**\`Em bi karê xwe kêfxweş in\`**

Sîham Ehmmed di dawiya axaftina xwe de got, em bi karê xwe kêfxweş in. Çimkî em alîkariyê didin civaka xwe û dilê wan geş dikin. Ji bo pêşketina çanda alîkariyê û rihê welatparêziyê pêwîstî bi xebata wiha heye. Banga me ji rêxistin û saziyên navneteweyî re jî heye ku bi me re bibin alîkar da em barê civaka xwe sivik bikin.

# Şervanên jin li Minbicê roleke mezin di parastina bajêr de dilîzin

**Şervanên jin yên Meclisa Leşkerî ya Minbicê ji bo rûbirûbûna êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk yên ser herêmê, li eniyên şer cihê xwe digrin û roleke mezin di parastina bajêr de dilîzin.**

Di demekê de ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di bin êrîşên Tirkiyeyê de ne, şervanên jin yên Meclisa Leşkerî ya Minbicê li eniyên şer bi cih bûne.

Ji 19’ê Mijdarê ve dewleta Tirk ya dagirker binpêkirinên xwe li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ji Til Rifetê heta Dêrikê zêde kirine û gefa operasyona bejayî dixwe û bajarê Minbicê jî di nav wan bajaran de ye.



**‘Em ê rê nedin Minbic careke din were dagirkirin’**

Seroka Meclisa Leşkerî ya Minbicê Sebah Îbrahîm bal kişand ser rola pêşeng û şervanên jin ên di nava refên Meclisa Leşkerî di parastina bajêr de ji her êrîşa dewleta Tirk û wiha got: “Em amade ne ku parastina xaka xwe bikin ji bo ku senaryoya dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî careke din



neyê dubarakirin. Tehdîdên dewleta tirk a dagirker li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne nû ne. Ev gef û binpêkirin bi hinceta parastina ewlekariya neteweyî ya Tirkiyeyê ne lê divê dewleta Tirk ewlekariya xwe di nava sînorên xwe de biparêze, ne bi êrîşkirina ser axa kesên din.”

Sebah Îbrahîm got ku ku gelo mimkun e bajarê ku xelkên wan koçber bûne û niha di kampan de dijîn wek bajarên ewle bi nav bikin û wiha pê de çû: “Gelo niha Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî bi ewle ne? Tişta ku li herêmên dagirkirî diqewime, mînakeke berbiçav e li ber çavên me. Xelkê wan bajaran bi darê zorê koçber bûne, yên mane jî rastî revandin û kuştinê tên û di rewşeke xerab de dijîn. Tirkiye hewl dide bajarê Minbicê dagir bike lê xelkê bajêr rê nadin wê yekê. Em bi tevahî amade ne ku her êrîşa Tirkiyeyê bişkînin û pêşî li dubarebûna wê senaryoyê bigrin.”

**‘Jin di refên herî pêş de bajar diparêzin’**

Sebah Îbrahîm teqezî li ser amadebûna tevahî şervan û Meclisa Minbicê ji bo parastina bajêr kir û wiha axaftina xwe berdewam kir: “Perwerdeya me berdewam dike û şervanên jin li eniyên şer bi cih dibin da ku rola xwe ji bo parastina civaka xwe bilîzin. Bajarê Minbicê dema ku ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hat dagirkirin, bi salan di nava tarîtiyê de ma. Xelkê bajarê Minbicê cara yekemîn e ku bajarê Minbicê birêve dibin lewma divê li gorî ezmûnên ku di salên krîza Sûriyeyê de tê de derbas bûne xwe biparêzin. Yên ku herî zêde ji çeteyên DAIŞ’ê zirar dîtin jin bûn. Jin ji bo parastina destkeftiyên ku bi saya şehîdan çêbûne, di refên herî pêş ên parêzvanên vê xakê de ne.”

**JÎNHA**



# Xebatên TEV ÇAND’a bakur û rojhilatê Sûrî yên salekê

Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamya li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê salekê di qadên Sînema, Şano, Mûzîk, Govend, Wênesazî û perwerdeyan de gavên pir girîng avêtin û encamên baş bidest xistin.

**Navenda Nûçeyan/ Qamişlo**

Yek ji tevgerên çandê ku li hemberî qirkirina li dijî çand, ziman û nasnameya Kurd têkoşîneke dimeşîne û rolek girîng di pêşketina karên çand, huner û wêjeyê de lîstiye. Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamya (TEV-ÇAND MEZOPOTAMYA) bû. Di her demê de bi rengekî çalak têkoşîn kiriye, bi karên xwe yên afirîner, dewlemend ên huner û wêjeyê bi berpirsyariya xwe ya li nava civakê rabûye, di karê çand-hunerê de qadên nû afirandiye, herwiha bi wezîfeya pêşvebirina çand û hunerê **rabûye**.

TEV-ÇAND MEZOPOTAMYA di meha Kanuna 2021’an de Konferansa xwe ya li ser asta Bakûr û Rojhiltê Sûryê lidarxist. Di konferansê de biryarên pir giring di derbarê hemû pîşeyên hunerî de hatin girtin, wekî ji nûve birêxistinkirina akademiyên bîrdozî û hunerî, lidarxistina mihrîcanan, hefteyên hunerî li bajar û gundan, avakirina peymangehên mûzîkê, kargehên govend û şano…hwd .

Ji hêla rêxistinî ve jî TEV-ÇAND MEZOPOTAMYA xwe li ser sîstema Kanton û pênc komînan di giştî herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriya yê de ji aliyê Mûzîk, Şano, Sînema, Govend,Wênesazî û peyker sazî de bi rêxistin kir.

Tevlî astengî û êrîşên dagirkeriyê yên ser tevayiya Kurdistanê jî, di nava vê sale de TEV-ÇAND MEZOPOTAMYA gelek xebatên Çandî û Hunerî meşandin û lidarxistin, hin xebatên wê yên sereke wiha ne.

**Xebatên perwerdeyan**

- 3’ê dewreyên Akademiya Şehîd Welat yên bîrdozî hatine lidarxistin.
- Perwerdeyeke birdozî ji hevserokên navend û kantonan re hatiye lidarxistin.

**Sînema**

Sala 2022’an li Rojava ji bo çand û hunerê sala Sînemayê bû, kar û xebatên Sînema ji hêla Komîna Sînema ya bi navê Komîna Film a Rojava ve hatine birêxistinkirin û **çêkirin.**



- Rêze filmê bi navê “ TAVA SOR “ ku ji 16 xelekan pêk dihat û li ser ekranê Stêrk TV hate weşandin.
- Filmê “ KOBANÊ “ ku bi derfet û hêza komîna film a Rojava û xebatkarên wê hat çêkirin û weşandin, hêj jî li bajar û herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê û derve jî tê gerandin û weşandin.
- Filmê “BERBÛ “ hat çêkirin û niha jî di Festivala Hindistanê ya Sînema yê de wê cih bigire.
- Filmê “DEMA DIRÎ REŞKAN, DEMA ŞITIL MEZIN DIBE, KOBANÊ, BERBÛ”bi SÎNE ÇIYA re galaya wan li Bakûr û Rojhilatê Sûrya yê hate çêkirin.
- Komîna Film a Rojava belge filmê KOBANÊ çêkir û hat weşandin.
- Komîna Film a Rojava bi Belge Film, Kurte Film û Filmên xwe tevlî Festîvala Almanya yê ya Sînema yê bû.
- Dîsa bi pêşengtiya Komîna Film a Rojava li Ewropa yê gelek Semîner û nîqaş li ser Sîstem û rewşa Rojava hatine meşandin.
- Kêşandina Rêze Filmê bi navê “EVÎNA KURD” yê ku ji 15 xelekan ve pêktê, ber bi dawiyê ve diçe. Niha Komîna Film a Rojava di kêşandina xeleka fînalê de ye, di sala nû de wê bikeve weşanê.

**Şano**

- Di roja 27’ê Adarê de bi boneya roja Şano ya cîhanê li gelek salonên navendên Çand û Hunerê Şano hatine pêşkêşkirin.
- 2’emîn Mihrîcana “ARÎN “ di dirêjahiya 10 rojan de li Kobanê hate lidarxistin.
- Ji encamê Mihrîcana “ARÎN “ de bi 2 Şanoyan beşdarî Festivala Kerkûk ê bûn û têde xelat girtin.
- Şanoya Mûzîkal ya bi navê “EVDALÊ ZEYNIKÊ” bi pêşengtiya Şanoya Çiya re hate kêşandin û weşandin.
- Dîsa bi pêşengtiya Şanoya Çiya re 2 kargehên Şanoyê yek li Dêrik û yek jî li Qamişlo di dirêjahiya 3 mehan de bi dawî bû, ji encamên van herdû Kargehan de 2 Şano bi navê “RASTÎ DAGIRKIRÎ Û DARA JIYANÊ” hatin Kêşandin û pêşkêşkirn.
- Şanoya bi navê “TAXA JIBÎRKIRÎ” jî li Çend bajarên herêma Cizîrê hate pêşkêşkirin.







**Mûzîk**

Ji hêla Mûzîkê ve jî di nava vê salê de bi dehan Stran û Kilîp hatine çêkirin û weşandin, hinek ji wan Kilîpan asta Kurdistanê jî derbaskirine û êdî bûne Cîhanî. Mînak kilîpa AWAZÊN WINDAYÎ, HEY ZAPÊ, SERÊKANIYÊ Û AVAŞÎN ya li ser bikaranîna çekên Kîmyewî…hwd, Hunergeha Welat di vê salê de zêdetirî 20 berheman him tomarkirin him jî kilîp çêkiriye.

Wekî din jî bi dehan Stran û Kilîp li Kobanê, Şehba, Tebqa û Reqa hatine çêkirin û weşandin.

-Hunermend û komên Mûzîkê yên TEV-ÇAND MEZOPOTAMYA bi dehan Şahî, Bîranîn, Salveger, Konsert… hwd hatîne li darxistin.

-Hefteyên Hunerî 2 caran hatine lidarxistin, di wan hefteyan de Mûzîk û Stran, Şano, Govend, Çêkirina xwarinên gelerî, Cil û Berg…hwd, di gund, tax û bajaran de, ji gel re hatine pêşkêşkirin.



**Govend**

- Kargeheke Govendê hatiye çêkirin û ji encama wê 4 Govendên gelerî yên resen wekî Kilîp hatine kêşandin.
- Tevlîbûna endamên Govendê ji praniya karên Hunerî re çêbûye, wekî Kilîp, Şano,Sînema…

Wênesazî

-Komînên wênesaziyê ji nû ve têne avakirin lê tevlî vê yekê jî gelek dewreyên wênesazî li gelek navedan hatine û têne çêkirin.

Herwiha bi dehan Pêşangeh li tevahî herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûrya yê hatine **lidarxistin**.

Plansaziya kar û xebatên pêşerojê

Li gorî plansaziya Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamya ( TEV-ÇAND MEZOPOTAMYA) li pêşiya wan gelek kar û xebatên li ser asta him Bakûr û Rojhilatê Sûrî yê, him jî li ser asta cîhanê hene û ji bo wan haziriyên xurt tên kirin, hin ji wan wiha ne:

- Mihrîcana Wêneyan(fotograf) ya navneteweyî wê li Rojava were lidarxistin.
- Mihrîcana Ş.Yekta ya şano
- Mihrîcana Orkêş ya Stran û Mûzîkê
- Mihrîcana Govendê
- Mihrîcana Sînema… hwd.

# Amani Ghaith bi pirtûka xwe hat ba xwendevanên xwe

**Nivîskar û helbestvan Amanî Ghaith pirtûka xwe ya bi navê ‘Kralîçeya Neva Anna Akhmatova’ cih da biyografiya bajarê herî li pêş ê Rusyayê Anna Akhmatova û helbestên wê.**

Di çarçoveya çalakiyên fuara pirtûkan a çanda Ereban a Beyrûdê de ku li Kompleksa Arenaya Biel Sea Side hat lidarxistin, helebestvan û nivîskar Amanî Ghaith li gel xwendevanên xwe hat cem hev. Amani Ghaith pirtûka xwe ya bi navê ‘Kraliçeya Neva, Anna Akhmatova’ ku ji aliyê weşanxeya Dar Al-Nahda ve hat weşandin îmza kir. Amani Ghaith helbest û nivîsên Anna Akhmatova ku di 23’ê Hezîrana sala 1889’an de li bajarê Odessa yê Ukranyayê ji dayik bûye û di 5’ê Adara 1966’an de jiyana xwe dest daye îlham girt û girt dest. Amani Ghaith bal kişand ser li Lubnanê xelaya ked û sotemeniyê û ji ber rêza li her cihê di ew rewşa zehmet re derbas dibin û got: “Pirtûk ji wergera sê tîp û 401 helbestan pêk tê, min sûd ji 10’an zêdetir nivîskarên Fransî girt. Helbestên Anna Akhmatov ji derveyî hinek pirtûkan 800 hezar zêdetir bûn. Helbestên ku di dema bombakirina mala wê de hatin şewitandin, koleksiyona wê ya yekem di sala 1912’an de hat weşandin. Helbeseta ku herî jê hez dikir yekê jê Pûşkin bû. Yekem helbestvan bû ku îsbat kir evîn weke mijarek helbestê ye.”

**Zextan dît**

Amani Ghaith diyar kir ku Anna Akhmatova di meydan xwendina her kesê de bal kişand û di 17 saliya xwe de dema ku Anna Akhmatova xwest helbestên xwe biweşîne rastî tundîtûjiya malbatê hat.

Amani Ghaith der barê ezmûna xwe ya yekem a der barê Anna Akhmatova de wiha got: “Ezmûna Anna Akhmatova bi teybetî jinên Rus û bi giştî serkeftinên jinan û der barê afrîneriya edabiyatê di qada helbestan de her dem bersiva pirsa min dikir. Li Rûsyayê yek ji helbestên herî girîng hatiye pejirandin û di dawiya temenê xwe de weke berendama xelata Nobelê hat destnîşankirin.”

Amani Ghaith di heman demê de bi bîr xist ku di heman demê de eve projeyeke romanê ye.

***-JİNHA***



# 'Ambargoya li ser herêma Şehbayê sûcekî li dijî mirovahiyê ye'

Cîgirê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrînê Fadil Çawîş diyar kir ku ambargoya li ser herêma Şehabyê ku bûye sedema girtina dibistanan sûcekî li dijî mirovahiyê ye û got, divê rêxistinên mafê mirovan yên navneteweyî bê deng nemînin û bi erkên xwe yê exlaqî rabin.

**Zana Roj/ Şehba**

Piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirkya ya dagirker û çeteyên wê ve, gelê Efrînê koçberî herêma Şehbayê bû. Gelê Efrînê ku derbasî hrêma Şehbayê bû, gav bi gav di tevayiya aliyan de jiyana xwe ji nû ve saz kir. Aliyê ku zêde zehmetî têde kişandin jî, perwerde û vekirina dibistanan bû. Avahiyên ku weke dibistan hatin bikaranîn, praniya wan rûxandîbûn û ji bo perwerdeya xwendekaran ne guncaw bûn, li hin deveran jî kon ji xwendekaran re hatin vekirin da ku ji xwendinê qut nebin. Desteya Fêrkirin û perwerdeyê li Şehba bi kêm derfet dibistan û peymangeh vekirin û serkeftinên mezin bi dest xistin. Lê ji ber girankirina ambargoya hikumeta Şamê ya ser herêma Şehbayê, ev meheke dibistan hatin girtin û xwendekar ji xwendina xwe qut bûne. Tevî ku dorpêç û ambargoya hikumeta Şamê ya li ser herêma Şehbayê tevayiya zagonên mafê mirovan binpê dike jî, rêxistin û saziyên mafên mirovan yên navneteweyeî xwe bêdeng dikinj û li gorî erkên xwe yên exlaqî tevnagerin.

**Derbarê embargoya hikumeta**

Şamê ya li ser herêma Şehbayê ku bûye sedema girtina dibistanan û gelek pirsgirêkên jiyanî, cîgirê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrîn Fadil Çawîş ji rojnameya me re axivî.

**'Di êrîşên ser Şehabyê de dibistan û zarok kirin armanc'**

Fadil Çawîş diyar kir ku êrîşên dewleta Tirki ya dagirker û dorpêça hikumeta Şamê ya li ser herêma Şehabyê ji beriya 4 salan ve û heta niha bênavber dewam dikin û got: " : Ji 4 salan ve û heyanî vê kêliyê, êrîşên dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê , herwiha dorpêça hikumeta Şamê li ser herêma Şehbayê bênavber dewam dike. Dewleta Tirk ya dagirker di êrîşên xwe yên li ser herêmê yekser dibistanan dike armanc. Di sala borî de dagirkeriyê dibistana Qeramêl kir hedefa êrîşeke hovane û diencamê de gelek ziyanên madî çêbûn, Herwiha beriya çend mehan dibistana gundê Bênê ya girêdayî navçeya Şêrawa hat hedef girtin, ev êrîş û bûyerên ku hatine rûdan bû



sedem ku gelek malbat zarokên xwe ji xwndina wan qut bikin. Dagirker bi tevayiya rêbazan hewil didin ku gelên herêmê qior bike".

**'Ambargoya li ser herêmê bû sedem ku tavahî dibistan werin girtin'**

Fadil da zanîn ku dorpêçkirina herêmê û nebûna madeyên sotemeniyê bû sedema girtina dibistanan û rawestandina perwerdeyê û wiha got: "Ji ber girankirina ambargoya hikumeta Şamê ya li ser herêma Şehabyê, tevayiya gelên herêmê zerareke mezin dibînin û rewşa jiyanê xerab bûye. Vê ambargoyê bandoreke neyênî li ser her aliyên jiyanî yên gel kiriye. Yek ji wan aliyên ku ambargoyê bandore lê kir jî, perwerdeya xwendekaran e. Ji ber ambargoyê madeyên sûtemeniyê yên ji bo germkirinê li ser herêmê hat qutkirin. Demsal zivistane û şagirtên seretayî nikarin sermayê tehmûl bikin,



ji ber nebûna madeyên sotemeniyê yên germkirinê jî, gelek xwendekar serma girtin û nexweş ketin. Herwiha ji ber nebûna erbeyan, çûn û hatina xwendekar û mamosteyên ji gondan pir zehmet bû, ji
wê biryar hat girtin ku tavahî dibistan werin sekinandin, eger ambargo were rakirin û sotemenî derbasî herêmê bibe wê demê emê dîsa dibistanan vekirin û perwerdeyê dewam bikin".

**' Ji mafê zarokan e ku perwerdeya xwe dewam bikin'**

Cîgirê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Efrîn Fadil Çawîş di dawiya axaftina xwe de bang li rêxistinên mirovî yên navneteweyî kir ku li hemberî êrîş û ambargoya li ser herêma Şehbayê xwe bêdeng nekin û got: "Êrîşên ser herêma Şehba û ambargoya ku hatiye ferzkirin, sûcekî li dijî mirovahiyê ye û tevayiya pêvan û zagonên navneteweyî binpê dike. Rojane dibistan û erebeyê zarokan tên hedefgirtin, zarok ji xwendin û perwerdeyê bê par mane, divê rêxistinên navneteweyê bêdeng nemînin û bi erkê xw yê exlaqî rabin, herwiha divê jiyan û mafên zarokan wrein parastin.".

# ÇIMA EWQAS TECRÎD?



**Rûstem Başûr**

Pergala desthilatdar, îro herî zêde li ser têkîliya ferd û civakê êrîş dike. Ji ber ji hêza civakê ya komkirî ditirse, ji bo wê jî tevahiya hewldana wê ji bo perçekirina civakê ye. Vê yekê bi rêbaz û taktîkên cûr be cûr dixîne pratîkê. Çawa ku civak xwe li ser hîmê têkîliya di navbera xwe û ferdên xwe de avadike, pergala desthilatdar jî xwe li ser hîmê siyaseta 'perçebike û bide meşandin' mezin dike. Ji ber çiqas perçe bike ewqas jî dikare têxe bin kontrola xwe û ewqas dikare li gorî berjewendiya xwe bide bikaranîn.

Bêguman ger mirov li gera dîrokê binêre ji destpêka şaristaniyê heyanî şaristaniya kapîtalîst, di serdema hişmendiya destlhilatdariyê de tecrîd wekî amûrekî bi pêşdebirina desthilatiya xwe hatiya bikaranîn. Cara yekem tecrîd ji hêla kesên serdest ên modernîta kapîtalîzm bi rêve dibin, hatiya dîtin ku ji bo bi awayekî baş bikaribin pergala xwe bixin di bin misogeriyê de. Tevî ku di dîrokê de gelek caran em rast tên, mirovên ku li hemberî vê pergalê serê xwe hildane, yan jî ji bo azadî û wekheviyê li ber xwe didin bi rêya komplo hatine girtin û bêdengkirin. Bi heman wextî rê li ber lêgerîna azadiyê jî girtine. Armanca kesên serdest, mêtînger ew e ku civakan ji nirxên wê yên kevneşop biyanî bikin û xwe li ser hafizeya gelan bi vî rêbazî dagir bikin.

Di navbera hêzên desthilatdar û hêzên civakî yên ku xwestine hebûna xwe ya civakî biparêzin de, jixwe herdem têkoşînek hebûye. Kesên ku ji civakê re di vê armancê de pêşengtî kirine bûne hedefa pergalê ya sereke. Ji ber pergal wer bawerdike ku bi têkbirina pêşengan wê bikaribe civakê jî bêdeng bike, yan jî têxe bin destên xwe. Di dîrokê de gelek caran ev nêzîkatiye rû daye. Lê bi keda pêşengên ku civak ji her milî ve amade kirine û asta xwe birêvebirin û baweriya serkeftinê avakirine, civaka exlaqî û polîtîk zû bi zû hilnaweşe û ji doza xwe paş ve namîne. Ya ku Rêber APO dixwaze di cavaka Kurd de avabike jî ev aste ye. Lewma tê dîtin, hêzên Kpîtalîst ji her demî zêdetir xwestina ku hizrên Rêber Apo çarmîx bikin. lê rastiyekî ebediya ku rêber Apo navenda Îmrali kiriya navenda hişmendî û fikra jiyana Azad.

Ji ber vê rêbazê ku dixwazin pê Rêber APO bêbandor bikin, rêbazeke binekol û pir zirav e. Bi tecrîda li ser Rêber APO, armanc ew e ku wî hêdî hêdî ji holê rabikin. Pergal bi vî awayî dixwaze jê tol hilîne. Ev rêbazeke ku bi carekê de nakuje, her rojê hêdî hêdî dikuje. Li cem vê dixwazin her kesê bi Rêber APO û doza azadiyê ve girêdayî, fêrî jiyaneke bêyî Rêbertiyê bikin. Têkîliya Rêbertiyê ji her kesê şopdarê meşa ber bi azadiyê û heqîqeta jiyana ku daye destpêkirin e, qut bikin.

Lewma tê dîtin ku hem hêzên Kapîtalîst hem jî dewleta tirk a qirker rê nade bi ti awayî hevdîtin bi Rêbertî re were bi pêşxistin. Ji ber ku baş dizane ger hevdîtin çêbibe, wê pirskirîka Kurd were çareserkirin. Lewma ev li hemberî berjewendiyên wan dibe kelem. Ango bi gotinekî din bandoriya Rêber Apo wê ber bi çareseriya demokratîk ve diha bi leztir be, Lewma ji vê jî ditrsin û ji bona hevdîtin çênebe bi îsrarin.

# Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê aplîkasyonek nû ya peywendiyê: Hekî

**Nivîsgeha Peywendiyan a Rêveberiya Xweser ji bo pêşxistin, hêsankirina dan û standinê û ewlekirina peywendiyên di nava gelê herêmê de aplîkasyonek nû çêdike, ji bo karê saziyên Rêveberiya Xweser jî aplîkasyonekê amade dike.**

Nivîsgeha Peywendiyan a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hevkariya şîrketa peywendaiyan Rcell cara yekê li herêmê aplîkasyona bi navê 'HEKÎ' (axaftin) bi pêş xist. Wê aplîkasyon di demeke nêz de li ber destan be.

Hevserokê Nivîsgeha Peywendiyan Xandî Hesen diyar kir ku pêwîstiya herêmê bi amûreke peywendiyan a taybet bi herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hebû, lê ji ber ku binesaziyeke yekbûyî ya hemû herêm û kantonên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tune bû, derfeta pêşxistina vê amûrê kêm bû. Hesen destnîşan kir ku di sala 2022`yan de binesaziya hemû herêm û rêveberiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirine yek û bi hev ve girê dane, ji lew re derfeta aktîfkirina şebekeyeke anku amûreke dan û standinê yê taybet bi herêmê hatiye peydakirin. Hesen têkildarî pêşxistina fikreya aplîkasyona Hekî ev tişt anî ziman: "Ev aplikasyon wê ji aliyê şebekeyê ve ji şebekeya 3G baştir be. Bi taybetî ji aliyê performans, deng, şandin û wergirtin, axaftina bi dîmen û şandina dosyayan de."

Li gotî Hesen, ji ber ku servera wê dê tenê li herêmê be, aplîkasyon dê taybet bi herêmên Bakur û Rojhilatê be. Gelek taybetmendiyên aplikasyonê hene, ji wan şebekeya hundirîn, ev jî tê wateya ku ji aliyê ewlehî û berdewamiyê ve dê amûra peywendiyê tenê hundirîn be. Anku li ku derê şebekeya Rcell hebe dê bixebite.

Aplîkasyona Hekî ku dişibe aplîkasyonên din ên mîna Wahtsapp, Viber û Signalê bê pere ye û li ser malpera fermi ya şîrketê dê were peydakirin. Di dema heyî de dê tenê li ser reqemên Rcell bixebite û dibe ku di demên pêş de li ser reqemên din ên Ewropayê û cîhanê jî bixebite. Taybetmendiyeke din a aplîkasyonê heye, ew jî dema ku paketa Rcellê nema, tenê dikare bi rêya nivîsê biaxive. Lê dema vê gavê dê sînordar be û li gorî Hesen ew ê di destpêka sala bê de, dema wê diyar bikin.

Aplîkasyon wê destpêka sala bê bikeve xizmetê. Her wiha di aplikasyonê de wê xizmeta 4 numre û 3 numreyan yên xizmetê û rewşên awarte jî hebe. Kompanyayên taybet û sazî dikarin reqemên ji 4 reqeman bi kar bînin, ji bo rewşên awarte jî reqemên ji 3 reqean dikarin bên bikaranîn. Bikaranîna wan reqeman di aplikasyonê de dê bêpere be.





**Piroja El-Hewkeme ya taybet bi saziyan**

Hesen destnîşan kir ku di sala 2023`yan de wê li ser pêkanîna projeya 'hewkemê elektroniyê' teknolojiya agahî û dan û standinê ya ji bo pêşêkirina xizmetên rêveberiyê (hikumetê) kar bikin, ango wê têkiliyên di navbera saziyên Rêveberiya Xweser, sazî û şaxê wê de dê bi awayekî elektronîk bi pêş bikeve û karê di nava xwe de bê meşandin." ***ANHA***



# HPG: Êrîşên Kîmyawî yên artêşa Tirk a dagirker dewam dikin

HPG'ê ragehand ku êrîşên Kîmyawî yên dagirkeriya Tirk yên ser qadên gerîla dewam dikin û got, artêşa Tirk a dagirker di 23'ê Kanûnê de 10 caran çeperên berxwedanê yên gerîla bi çekên kîmyewî bombebaran kir.



**Navenda Nûçeyan**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama çalakiya hêzên wan de dagirkerek hate cezakirin. Herwiha da zanîn ku artêşa Tirk a dagirker çeperên berxwedanê yên gerîla; 10 caran bi çekên kîmyewî bombe kir, madeyên plastîk û lastîkên wesayîtan şewitandin û dûyê jehrî şandin ser çeperên berxwedanê. HPG'ê da xuyakirin ku di heman demê de dagirkeran 4 caran bi balafirên şer, 12 caran bi helîkopterên êrîşê û bi dehan caran jî bi obus, tank û çekên giran qad bombebaran kiriye.

HPG'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Bazên Zagrosê de de li herêma Zapê di 23'ê Kanûnê saet 09:00'an de dagirkerên li derdora gundê Sîda yê girêdayî bajarokê Şêladizê ya navçeya Amediyê, ji aliyê tîmên wan yên bi tevger ve bi taktîka sûîqestê hatine lêdan û dagirkerek hatiye cezakirin.

HPG'ê derbarê êrîşên ku artêşa Tirk a dagirker ên bi bombeyên qedexe û çekên kîmyewî bi kar aniye wiha got: "Artêşa Tirk a dagirker di 23'ê Kanûnê de ji danê sibehî heta bi şev 10 caran çeperên berxwedanê yên gerîla yên li nêzî qada Çemço ya girêdayî bajarokê Şêladizê ya Amediyê bi çekên kîmyewî bombebaran kir. Di heman demê de dagirker madeyên plastî û lastîkên wesayîtan şewitandin û berê dûyê jehrî şandine ser çeperên berxwedanê. Di 23'ê Kanûnê de çeperên berxwedanê yên gerîla yên li nêzî bejahiya Çarçel a Metîna û gundê Sîda yê girêdayî bajarokê Şêladizê ya navçeya Amediyê 4 caran bi balafirên şer hatin bombekirin.Di 23'ê Kanûnê de Qadên Berxwedanê yên Saca û Kurojahro 12 caran ji aliyê helîkopterên êrîşê ve hatin bombekirin. Di 23'ê Kanûnê de Qada Berxwedanê ya Girê FM û gundê Sîda yê bajarokê Şêladizê ya navçeya Amediyê û çeperên berxwedanê yên gerîla yên li nêzî qada Çemço bi dehan caran bi obus, tank û çekên giran hatin bombekirin."

# Komkujiya Parîsê bi tundî hat şermezarkirin

**Navenda Nûçeyan**

**Gelek partî, sazî , destegeh û tevgerên Kurd yên li Kurdistan û Ewropayê bi daxuyaniyan komkujiya ku li dijî Navenda Çandê ya Kurd a Ahmet Kaya ya Parîsê şermezar kirin û bang li dewleta Ferensa kirin ku nebe hevkarê qirkirina Kurdan û berpirsên komkujiyê eşkere bike.**

Di 23'ê Kanûnê de, li dijî Navenda Çandê ya Kurd a Ahmet Kaya ya li Parîsê êrîşeke hat kirin, di encama êrişa hovane de yek ji pêşengên Tevgera Jinên Kurd Evîn (Emîne Kara), ji Tevgera Çandê Mîr Perwer û endamê Navenda Çandê Abdurrahman Kizil şehîd bûn.

Derbarê êrîşa li Parîsê prtî, destgeh, sazî û komeleyê Kurdan bi




daxuyaniyaniyan êrîş şermezar kirin û banga tevlîbûna çalakiyên şermezarkirinê kirin, herwiha ji dewleta Ferensa xwestin ku bi awayekî zelal komkujiyê eşkre bike û kujeran darizîne. Gelek tevgerên û hin partiyên Ewropî jî komkujiya Parîsê şermezar kirin û banga pêkanîna edaletê kirin.

Gelên Kurd û dostên wan li Kurdistan û Ewropayê jî, li dijî komkujiya li Parêsî daketin qadan, ji dewleta Ferensa xwestin ku nebe hevkarê qirkirina gelê Kurd û kujer bilez bên eşkerekirin.

Navên hin partî, sazî, destgeh, tevger û aliyên Kurd û Ewropî yên ku komkujiya Parîsê şermezar kirine wih ne:

Koordînasyona Komeleya Jinên Kurdistanê (KJK), Konseya Rêvebir a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK), Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD), Konseya Rêveber a KCK'ê, TEV-Çand Ewropayê, Însiyatîfa Jin Kurdistanê ji Dagirkeriyê Diparêzin, Kongra Star, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê (Tevgera Azadî), Komîteya Rêveber a Tevgera Şoreşger a Yekbûyî ya Gelan (HBDH) , Xwendekarên Zanîngeha Kobanê, Tevgera Çand û Hunera Baqî Xido, Navenda Çanda Êzdîxan (NÇÊ), Civaka Îslamî ya Kurdistanê, , Tevgera Çanda Jinên Kevana Zerîn, Konfederasyona Koçberên Bindest a Ewropayê AVEG-KON, Tora Riseup4Rojava û DefendKurdistan, Yekîtiya Jinên Elewî yên Ewropayê (AABK), Yekîtiya Karkerên Koçber ên Ewropayê (AGEB), Partiya Îslamiya Kurdistanê (PÎK), Koordînasyona Civaka Êzidî ya li Ewropayê, Hêza Yekbûyî ya Demokratîk a Ewropayê, Kongreya Parlamenteran a Spanyayê, Ûnîdas Podemos û Galîcîa, Konseya Kurd a Demokratîk a Fransayê (CDK-F).

# Dijî qetilkirina Ayda Rustemî nerazîbûn

**Dixtor Xalid Dawûd destnîşan kir ku kuştina Ayda Rustemî derveyî pîvanên exlaqî û mirovî ye, lewma divê bûyer were lêkolînkirin. Endama Kordînasyona Kongra Star Rihan Loqo jî got ew ê li dijî desthilatdariyê têkoşîna xwe bidomînin û banga piştgiriya serhildana Rojhilat û Îranê li hemû saziyên jinan kir.**

Endama Koordînasyona Kongra Star Rihan Loqo û Serokê Desteya Tenduristiyê ya Herêma Cizîrê Dixtor Xalid Dawûd derbarê qetilkirina Dixtor Ayda Rusmetî ya ku dema birîndarên serhildana li Îranê derman dikirin ji aliyê hêzên



rejîmê ve bi îşkenceyê hatibû kuştin de, ji ajansa me re axivîn.

Rihan Loqo destnîşan kir ku li Rojihlatê Kurdistanê û Îranê bi pêşengiya jinan têkoşîna mafan tê dayîn, lê desthilatdariya ku xwe li viya ranagire êrîşên xwe zêdetir kirine. Rihan Loqo anî ziman ku gelên Rojhilat û Îranê êdî zilm û desthilatdariya hişk qebûl nake, ji



bo azadiyê berdêlan didin û got: "Yek ji van jî Ayda Rûstemî ya ku 16'ê Kanunê hate kuştin e. Ayda Rustemî birîndarên serhildanê derman dikirin, lewma hat hedefgirtin û ew şehîd xistin. Ayda bi erke xwe yê exlaqî radibû, lê hat hedefgirtin. Her wiha îdîa kirin k udi qezayê de jiyana xwe ji dest daye. Rastiya xwe vedişêrin, lê



nikarin.

Endama Koordînasyona Kongreya Star Rîhan Loqo di dawiya axaftina xwe de êrîş şermezar kirin û got ku heta desthiltdarî hebe ew ê li qada bin û têkoşîna xwe berdewam bikin. Her wiha bang li tevahiya sazî û rêxistinên jinan kir ku bi hev re nirxên xwe biparêzin û piştgiriya serhildanên li Îranê bikin.

Hevserokê Desteya Tenduristiyê Dixtor Xalid Dawûd jî destnîşan kir ku nêzîkahiya desthilatdariya Îranê ya li hemberî jinan derveyî exlaq û pîvanên mirovahiyê ye. Xalida Dawûd bibîr xist ku hêzên Îranê bi rêbaza îşkenceyê Jîna Emînî ya ku bûye sembola serhildanê kuştine, niha jî bi heman rêbazê Dixtor Ayda Rustemî qetil kiriye. Xalid Dawûd nerazîbûna xwe wiha anî ziman: "Em vê rêbaza qirêj a ku Rejîma Îranê dide meşandin şermezar dikin. Pêwîst e komîteyeke hiqûqî were avakirin û kuştina Ayda Rustemî bê eşkerekirin."

***-ANHA***

# Rewşenbîr: CPT şirîkê tecrîda li dijî Rêbertî ye

Rewşenbîrên Tebqayê da zanîn ku paşguhkirina CPT'yê ji erkên xwe re dewama Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan e û got bêdengiya rêxistinên mirovî û hiqûqî li hember tecrîda li dijî rêber Ocalan hevkarî ye.








Bertekên li dijî tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan a ji zêdetirî 23 salan ve, zêde dibin.
Di Îlonê de CPT`yê serdana Îmraliyê kir û tu agahî ji Buroya Hiqûqê ya Sedsalê re li ser rewşa rêber Abdullah Ocalan eşkere nekirin.

Girêdayî mijarê, hevserokê Yekitiya Rewşenbîran a Tebqayê Şeze El Hisên tecrîda li dijî rêber Ocalan a ji hêla dewleta Tirk a dagirker ve û redkirina daxwaznameyên parêzer û malbata rêber Ocalan di dirêjahiya 21 mehan de ji bo hevdîtinê, şermezar kirin.

Şeze El Hisên serdana CPT`yê di Îlonê de bêyî aşkerakirina tu agahiyan ji Buroya Hiqûqê ya Sedsalê re li ser rewşa rêber Ocalan bi dewama kompoloyê li dijî rêber Ocalan wesif kir û got: “Hêzên kapîtalîst bi mebest tecrîdê ferz dikin û rastiyê vedişêrin.”
Li aliyekî din jî endamê yekitiyê Mehmûd El Îsa wiha got: “Di ser tecîrda li dijî rêber Ocalan re 23 sal derbas bûn û dem hatiye ku li hember vê doza mirovahî bi exlaq û heq were sekinandin.”

El Îsa ev tişt anî ziman: “Em bi demeke dirêj li bendê bûn ku CPT`ê rastiya rewşa tecîrda li dijî rêber Ocalan aşkera bike. Lê CPT`yê tu bersiveke erênî nîşan neda û tu agahî jî li ser rewşa rêbertî ji Buroya Hiqûqê ya Sedsalê re aşkera nekirin.”

El Îsa diyar kir ku ger CPT helwesta xwe bidomîne dê bibe şirîkê vî sûcî û ger rêxistinên hiqûqî û mirovî tev negerin, ew jî di vê sûcê de şirîk in.

El Îsa tecrîda li dijî rêber Ocalan bi “zulmê” wesif kir û wiha pê de çû: “Kesayetek bi nirx û qîmeta rêber Ocalan tenê ji bo fikr û pransîbên wî tê revandin, ev tiştekî zilm e.”

El Îsa got mijara rêber Ocalan ne tenê qanûnî ye, lê belê çandî û fikrî ye, ji lew re hêzên kapîtalîst di serî de dewleta Tirk a erkdar tecrîdê giran dike û bi fîzîkî rêber Ocalan ji gel vedişêre.
***ANHA***

# Endamê YNK’ê: Parastina Rojavayê Kurdistanê, erkê me hemûyan e

**Endamê Mekteba Peywendiyên YNK’ê destnîşan kir ku armanca serdana Bafil Talebanî ya ji bo Rojavayê Kurdistanê avakirina yekitiya hêzên Kurd e û got: “ Ji erkê her kesê ye ku yekgirtî, yek deng û yek helwest bin.”**



Di 20’ê Kanûn de Serokê Yekitiya Nîştîmaniya Kurdistanê (YNK) Bafil Talebanî serdana Rojavayê Kurdistanê kir û li gel Fermandarê Hêzên QSD’ê Mazlûm Ebdî, Hevserokên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Salih Muslim û Asya Ebdula re civiya.
Di derbarê serdana Bafil Talebanî ya ji bo Rojavayê Kurdistanê de Endamê Mekteba Peywendiyên Yekitiya Nîştîmaniya Kurdistanê (YNK) Rewend Xerîb Heledinî axivî.
Rewend Xerîb di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku armanca Bafil Talebanî ji vê serdanê, destpêkirina projeyekî neteweyî bû û wiha got: “Armanca serdana Bafil Talebanî ji bo yek kirina hêz û karîna hemû Kurdan e û her wiha pêknanîna yekitiya neteweyî ya gelê Kurd e. Em di wê baweriyê de ne ku ev yekîtî, mafên demokratîk ên gelê Kurd yên li her çar parçeyên Kurdistanê misoger bike. Yekitiya gelê Kurd û peywendiyên dostane yên di navbera hêz û aliyên siyasî de, wê hebûna Herêma Kurdistanê ji metirsî û gefên ku ji dagirkeriya hinek dewletên ku dixwazin mafên me yên rewa têk bibin tên, biparêze.”
Rewend Xerîb di dewama axaftina xwe de destnîşan kir ku ew ezmûna li Rojavayê Kurdistanê pêkhatî, di encama rijandina gelek xwîn û hêstiran de hatiye bidest xistin, ji bo wê erkê her kesê ye ku yekgirtî, yek deng û yek helwest bin. Rewend Xerib wiha domand: “Divê hebûna destkeftiyan bi parêzin û ji bo hîn zêdetir pêşketinê hevkariyê bikin. Werin em alîkariya wê bikin ku zêdetir pêş bikeve û bikaribe di çarçoveya destûrê de pêgeheke demokratîk bidest bixe. Her wiha civaka navneteweyî jî bigihîne wê astê ku alîkariya me bike û piştgiriya mafên me bike.”
Rewend Xerîb serdana Bafil Talebanî weke serdanek giring û dîrokî pênase kir û wiha pê de çû: “Serdana Bafil Talebanî di demeke krîtîk de ye, ji ber ku niha gef û metirsiyên cidî û guhertinên bi lez li herêmê hene. Bafil Talebanî dixwaze bi rêya siyasetê projeyek neteweyî destpê bike ku hemû hêz û aliyên Kurdî li ser maseya guftugo bikin û yekitiya Kurdan çêbikin. Ev demek dirêje ku em bi pirsgirêka ku em nikarin yekitiya aliyên Kurdî pêk bînin ve girêdidin. Her dema ku me nekarî yekitiya xwe avakiriye, me kariye destkeftiyên mezin bi dest bêxin. Eger em yekbin û bi hev re rûnin li ser hinek mijarên netewî li hev bikin, bê guman emê pir bi hêz bin û hem jî civaka navneteweyî jî dê baştir piştgiriya me bike. Eger em nebin yek, emê piştgiriya dostên xwe ji dest bidin û em ê nikaribin di parçebûnê de li hemberî planên



yekitiya xwe avabikin, dijminên me karîne xwe bixin nava kavilên ne yekbûna me û karîne ji wir bigihijin armancên xwe yên qirêj. qirêj ên dijminên me li ber xwe bidin.”
**ROJNEWS**

## Dîsa Parîs…



Farûk SAKIK

Li Fransa ev 10 sal in lêgerîna kurdan a edaletê hebû, niha jî lêgerîneke din lê zêdebû. 3 şehîdên me hene; Têkoşera pêngava Jin jiyane Azadî Emîna Kara, Hunermendê ciwan û bedew Mîr Perwer û welatparêzê hêja, Abdullah Kara.
Em ji ku derê destpêbikin nizanim! .
Berî vê komkujiyê min ‘komkujiya Mereşê’ nivisî û ji rojnamê re şandibû. Dema ku ji Parîsê ew xebera reş hat, min weşana vê nivîsê rawestand.
Lê her tişt bi komkujiya Mereşê re destpêkir.
PKK hatibû damezirandin û li nav kurdan de tovê azadiya Kurdistanê belav dibû.
Ji bo pêşîgirtina vê pêlê dewleta Tirk dest bi komkujiyan kir.
Ev komkujî weke xelekekê li pey hev dewam kir, xeleka dawî jî komkujiya Parîsê ya 23 Kanûna 2022 an bû.
Kurd adresa ku tetîkêş ji kuderê birêketî baş dizanin. Herkes dibêje ji Enqerê birêketî ye.
Çima di demeke waha de Erdogan çavsorî bûye û ji bo seknandina çûyîna xwe her tiştî dike.
Erdogan çikir? Êrişî Zapê kir û encam negirt.
Êrişî Rojava kir û bi serneket. Rabû îstixbarata xwe xist dewrê û berê wan da Parîsê.
Erdogan li pey serkeftinekê bû, Ji şehîdan Emîna Kara tesaduf nebû. Kurdan dema şehadeta Emîne Kara bihîstin, Sakîne Cansiz hat bîra wan.
Pirsek din, çima Parîs? Dewleta Tirkiyê, helwesta dewleta Fransa ya ji bo kurdan dizane. Ji bo vê helwestê sabote û berteraf bike, reşkujiyên xwe li vî welatî pêktîne.
Di reşkujiya 10 salên berê de, bi belge û îtirafan ev reşkujî hat isbatkirin ku ji aliyê dewleta Tirkiyê ve hatiye kirin.
Kurd vê yekê dizanin di vî warî de zelal in. Lê ji dewleta Fransa bendewariyên edaletê hene.
Kurd dibêjin hûn jî van delîl û îspatan dizanin.
Ev belge di dest hiqûq û îstixbarata we de jî hene û hûn çima dewleta Tirkiyê mehkûm nakin.
An jî bi daxwiyaniyekê hûn çima nabêjin ey dewleta Tirkiyê we çima ev 2 reşkujî li welatê me pêkanî.
Hadî daxwaza kurdan ya lêgerîna edaletê deynin aliyekî, xwe û edaleta xwe derxin pakiyê.
Ey Fransa hûn çima destûrê didin, welatê we yê bi naskirina mafên mirovan tê nasandin, bibe navenda reşkujiyan.
Hûn di Lozanê de bûn sebeb ku ew kurdên ku li wê derê hatin qetilkirin hatin wêder. Piştî şerê cîhanê yê yekem bi salan hûn li ser xaka me metînger bûn.
Dewlemendiyên axa me we dizî anî û me dagirkerên welatê me rûbirû hişt. Dagirker bi vê yekê jî qanî nebûn dest bi zilmê kirin. Ev kurdên li welatê we hatin qetilkirin ji ber wê zilmê hatin.
Belê Fransa me ji ev yek dixwest, lê we çikir ?
Piştî reşkujiyê bi nîv seatê, dozgerê we daxuyanî, da.
Digot: yekî nijadperest, yekî nû ji zindanê derketî û berê jî êrîşek li dijî kampa penaberan bi şûr êrîş kiriye.
Ê başe! Gelo çima îstixbarata we kesekî bi vî rengî ne şopand?
Daxuyaniyên rayedarên Fransa û navnetewî derbarê buyerê de baş bûn, lê gelo ev ji bo sarkirina Kurdan e, yan jî hûn di vê mijarê de ceddî ne?
Tişta herî giring ji bo Kurdan ewe ku rastiya vê êrîşê were eşkerekirin,
Kî li pey vê êrîşê ye?, êrîş çawa hatiye organîzekirin? Di rojên pêş de wê gavên bi çi awayî werin avêtin?.
Civaka Kurd li Ewrupa û diyasporayê, vê care wê bê deng nemîne, civaka Kurd û dostên xwe yên Ewrupî wê heta eşkerekirina vê êrîşê li qadan bin û wê bêdeng nemînin.



# KCK: Berpirsê qetlîamê desthilata AKP-MHP ye

KCK’ê qetlîama li Parîsê şermezar kir û got, berpirsê qetlîamê desthilata AKP-MHP ye, eger li ser Qetlîma 9’ê Çileyê nehatiba nixumandin îro ev qetlîam pêk nedihat, pêwîste gelê me û dostên wan bi awayekî demokratîk bertekên xwe nîşan bidin.

**Navenda Nûçeyan**

Konseya Rêveber a KCK’ê li ser qetlîama li Parîsa paytexta Fransayê ku tê de 3 Kurd hatin qetilkirin, daxuyaniyeke nivîskî weşand. KCK’ê qetlîam wek dewama Qetlîama 9’ê Çileyê pênase kir û destnîşan kir ku berpirsa vê qetlîamê jî AKP-MHP û MÎT in.

“KCK’ê êrîşa li Parîsê ku têde 3 Kurd hatine qetilkirin şermezar kir û got: “Li dijî Navenda Çandê ya Kurd a Ahmet Kaya ya li Parîsê êrîşek hatiye kirin û di êrîşê de gelek Kurd birîndar bûne û jiyana xwe ji dest dane. Em vê êrîşa diyar e ku ji aliyê desthilata AKP-MHP’ê ve hatiye kirin, şermezar dikin. Yên di êrîşê de jiyana xwe ji dest dane bi rêzdarî bi bîr tînin. Ên di vê êrîşê de jiyana xwe ji dest dan, şehîdên nemir ên Kurdistanê ne. Gelê Kurdistanê û dostên Kurdan divê bi awayekê xurt bertek nîşanê vê qetlîamê bidin û bibin xwedî li şehîdên nemir û bibîranînên wan.”
.

**’AKP-MHP li her derê dijminahiya Kurdan dikin’**

KCK’ê da xuyakirin ku ev qetlîam, dewama qetlîama Parîsê ya 9’ê Çileyê 2013’an e û wiha dewam kir: “Dewleta Tirk, bi êrîşa ku 9’ê Çileyê 2013’an li Parîsê kir û 3 Kurdên welatparêz ên şoreşger qetil kirin, qetlîama Kurdan bir Ewropayê. Wek qetlîama 9’ê Çileyê 2013’an ev qetlîam jî ji aliyê dewleta Tirk a qirker û mêtinger û desthilata faşîst a AKP-MHP’ê ve hatiye kirin. AKP-MHP neyarên Kurdan in û li her derê dijminahiya Kurdan dikin. Kurdistaniyên li Ewropayê jî bi vê hişmendiyê dikin armanc. Ev qetlîam jî ji aliyê dewleta Tirk, desthilata AKP-MHP’ê û MÎT’ê ve hatiye kirin. Eger dewletên Ewropayê û rêxistinên îstixbaratê nebêjin erê û piştgiriyê nekin, dewleta Tirk û MÎT bi tena serê xwe nikarin van êrîşan bikin. Ev rastiyeke li ber çavan e û divê her kes pê bizane. Li cihekê mîna Parîsê, ji aliyê îstixbarat û ewlehiyê ve şopandina her derê tê kirin; bi kirina vê qetlîamê ev rastî derdikeve holê.”.



**’Eger li ser Qetlîma 9’ê Çileyê nehatiba nixumandin îro ev qetlîam pêk nedihat’**

KCK’ê da zanîn ku eger li ser Qetlîma 9’ê Çileyê nehatiba nixumandin û qetlîam bihatiba ronîkirin, îro ev qetlîam pêk nedihat û wiha got: “Tevî ku eşkere ye ku Qetlîama 9’ê Çileya 2013’an ji aliyê dewleta Tirk û MÎT’ê ve hatiye kirin jî, ev qetlîam ji aliyê dewleta Fransayê ve nehat ronîkirin û rastiya wê derneket holê. Faîlê Qetlîama 9’ê Çileyê li girtîgehê hat kuştin û li ser dosya hat girtin. Eger li ser Qetlîma 9’ê Çileyê nehatiba nixumandin û qetlîam bihatiba ronîkirin, îro ev qetlîam pêk nedihat û wê pêşî li qetlîamên bi vî rengî bihata girtin.”
KCK’ê diyar kir ku şerê desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê yê ku li dijî Kurdan dide meşandin yek lingê xwe li Ewropayê ye û wiha dewam kir: “Zext û destgîrkirinên duh li Elmanyayê li dijî sazî û welatparêzên Kurd hatin destpêkirin û komkujiya îro li Parîsê pêk hat, nîşan dide ku konseptek nû ya li dijî Kurdan a ku desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê li Ewropayê ferz kiriye, hatiye amadekirin û xistiye meriyetê.”

KCK’ê da xuyakirin ku ger bi rastî têkiliya dewleta Frans bi êrîşê re tune be, divê van qetlîaman ronî bike û rastiyan vebêje û wiha got: “Divê dewleta Fransa Qetlîama 9’ê Çileyê ronî bike û agahiyên qayîl bike ku rastiyê derxe holê. Her wiha divê li ser qetlîma ku îro hatiye kirin raweste û vê qetlîamê ronî bike. Divê helwestên ku vê qetlîamê hêsan dikin an jî tarî dikin nebin. Ger dewlet û hikûmeta Fransa bi vî rengî nêz bibe, giraniyê bide ser vê yekê û rastiyan bi zelalî eşkere bike, wê ev sûc ji holê rabe. Ger wiha nebe, dewleta Fransa nikare ji vê tewanbariyê derkeve û ne em û ne jî gelê Kurdistanê nikarin wisa hizir bikin ku dewleta Fransa bi erênî û bi bawerî nêzîk dibe.”

**’Divê Fransa piştgiriyê nede polîtîkayên qirkirina Kurdan’**

KCK’ê da xuyakirin ku divê tu dewletên Ewropa, bi taybetî jî dewleta Fransa, piştgiriyê nede polîtîkayên qirkirina Kurdan a hikûmeta faşîst a AKP-MHP’ê û li dijî vê derkeve û wiha domand: “Nêzîkatiyeke bi vî rengî jî pêdiviya nirxên demokratîk ên Ewropayê ye. Ger tê bawerkirin ku li Ewropayê nirxên demokratîk hene, divê polîtîkayên qirkirina Kurdan ên desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê ya dij-demokratîk neyê piştgirîkirin.”

**’Pêwîste gelê me û dostên wan bi awayekî demokratîk bertekên xwe nîşan bidin’**

Konseya Rêveber a KCK’ê diyar kir ku divê gelê Kurdistanê û dostên wan biçin Parîsê û bertekên xwe yên demokratîk nîşan bidin û wiha got: “Divê her kes biherike Parîsê û heta ev qetlîamên li ser Kurdan ronî bibin, timî di nava çalakiyan de bin. Pêwîste gelê me û dostên gelê me bi awayekî demokratîk bertekên xwe nîşan bidin, ji tundiyê dûr bisekinin. Li hemberî provokasyonan baldar bin û bi rêxistinî tevbigerin. Divê raya giştî ya Ewropayê jî ji bo eşkerekirina rastiyan bi hemû aliyên xwe û ronîkirina van qetlîamên li ser Kurdan zêdetir hewl bide û bi têkoşîna rewa ya demokratîk a gelê Kurd re dengê xwe bilind bike.”

# Ciwanan bang li ‘hikumeta Şamê’ kir ku dorpêça li ser Şehba û Helebê rake

**Ciwanên Meclisa Malbatên Şehîdan a herêma Firatê bang li hikumeta Şamê kir ku yekser dorpêça li ser Şehbayê, taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi dawî bike.**
Têkildarî dorpêça tund a li dijî kantona Şehbayê, taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê ji hêla hikumeta Şamê ve, Ciwanên Meclisa Malbatên Şehîdan a herêma Firatê axivîn.
Ciwanê bi navê Hecî Golagasî wiha got: “Rejîma Sûriyê careke din dorpêç li dijî taxên Şexmeqsûd û Eşrefiyê biriye û bû sedema krîzeke mirovî. Ev yek li dijî qanûnên mirovî ye. Ji ber îro bi sedan nexweş di nexweşxaneyan de bê derman in.”
Hecî Golagasî siyaseta ku hikumeta Şamê pêk tîne şermezar kir û wiha got: “Her tişt ji rejîma Sûriyê tê texmînkirin. Yê li hember êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê deng e, normal e gel ji derman qut bike.”
Li ser mijarê Rojîn Muslim ev tişt got: “Di navbera dewleta Tirk a dagirker û rejîma Sûriyê de têkildarî şerê li dijî gelê herêmê hevkariyek hye. Dewleta Tirk a dagirker bi hemû rêbazan gelê herêmê têk dibe, rejîma Sûriyê jî dorpêçek biriye; nahêle xurdemenî û derman derbasî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û kantona Şehbayê bibin.”
Rojîn wiha domand: “Li şûna rejîm parastina gelê xwe bike û derman jê re peyda bike, krîzeke mirovî pêk tîne û azarên nexweşan zêde dike.”
Ciwana bi navê Zên Ehmed jî ev tişt anî ziman: “Êdî her kes dizane kî parastina xaka Sûriyê, gel û erdnîgariya wê ji dagirkeriyê dike û kî dibe sedema pergendebûna wan. Careke din rejîma Sûriyê îsbat kir ku dev ji zîhniyeta xwe berneda û hewl dide bi rêya dorpêçê sûriyan pergende bike.”
Zên di dawiyê de bang li hikumeta Şamê kir ku yekser dorpêçê ji ser taxên dorpêçkirî bi dawî bike û wiha got: “Em Ciwanên Meclisa Malbatên Şehîdan, ji bo şikandona dorpêçê û piştgiriya gelê li Şehba, taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, amade ne her tiştî bikin.” ***ANHA***







## FENER

## Tecrîd Teyisandina Qirkirinê Ye



Idrîs HENAN

Tecrîd aliyê zimên de polîtîkayeke bi mebesta rêgirtina li ber çareseriyê ye. Aliyek din ve jî; destwerdana hişmendî û avakirina ferasета serdestiyê ya rewakirina êrişên qirkirin û siyasetên asîmîlekirinê ye.
Tecrîd bi hemû rengên xwe dûrxistina mirov ji jiyana xwezayî ya bi rûmet e. Her wiha binpêkirina mafên veguherîn û awantajên pratîzekirinên demokrasiyê ye. Di binyada zihniyeta ku tecrîdê weke çek bikar tîne de; sepandina teslîmiyetê heye.
Heya ku însan dûrî baweriyên xwe keve û ji xebat û têkoşînên neteweyî û mirovî bêpar û bêbandor bimîne û di çarçoveya berjewendiyên qata desthilat de bizivire, îzolekirin xwedî bandorek sihirwar e. Lew re ji bo ku rejîmên faşîst yên desthilatdariya wan têk çûye ji nû ve bibin otorîter, berê xwe didin dijberên ideolojîk û bi rêya şîdetê wan dûrî saheya çareseriyê dikin û bê îrade dikin. Tecrîdê lê dişidînin û ji olê heya netewperstiyê, bi awayekî gelek çors bikar tînin. Vê yekê jî li ser bingeha daneheva zordariyê pêk tînin ku hemû cokên herikîna feraseta zelal bixetimînin û rê li ber avakirina aqilê giştî yê civakeke azad û demokrat bigirin.
Nêzîkatî û siyasetên bi vî rengî veguherîne pêkenokeke dîrokî û cihên qeşafiyê ne ku mafên mirovan di jiyîna bi rûmet û veguherînê de dadiqurtînin. Tişta ku îro li ber çavan e ew e; şêwazên zêde yên tevliheviyê ne, di heman demê de têkbirinên aborî, ewlekarî û istiqrarê ne.
Siyasetên bi vî awayî di derheqê gelan û lîderên wan de, bi wateya qirkirinê pêk tên. Lewre; ancax bi hiqûqa ku pala xwe dide pernsîbên exlaqî û darzandinek dadmend, kiryarên wisan ên dermirovî werin mehkûmkirin. Di esasê xwe de sûcên li dijî îradeya hebûna mirov in. ji ber vê jî bi tecrîdê re asta êrişan bilind dibe.

Piştî ku faşîzma tirk îzoleya li ser Rêber Ocalan şidand, êrişên li ser gelê Kurd û destkeftiyên zêde kirin. Li Rojava dagikerî û êirşên hovane bi awayek rojane pêk tê. Li Bakurê Kurdistanê pêşengên gel binçav dike û hemû girtîgeh xistine bin îzolekirina sîstematîk ku veguherîne cihên mirinê. Her wiha li Başûrê Kurdistanê bê navber êrişên bi çekên qedexekirî û yên kîmyawî pêk tên. Heman wextê de bi rejîmên mêtingerên Kurdistanê re li hev dike ku vîna Kurdan îzole û qir bike.
Ji ber ku serdestî navendên aloziyê ne yên çareseriyê ne, piştî Tebaxa 2019an dema Rêber Ocalan got ku; hêza min ya çareserkirina aloziyê û bêdengkirina çekana nava hefteyekê de heye, faşîzma tirk tecrîd zêde kir û xwest vê rola berbiçav a Rêber Ocalan, di vê qonaxê de, vala derxîne. Ji ber ku faşîzm li dijî rêbaz û sentezên aşîtiyane ye û naxwaze gola aloziyan vala bibe. Ew baş dizanin ku ramanên Rêber Ocalan li ser bingeha aşîtî, demokrasî, wekhevî, pêkve jiyan û edaletê hatine hûnandin. Baş jî dizanin çiqas bandora vê yekê li ser Kurdistanê û tevayî cîhanê heye. Têdigihêjin ku çareserkirina doza Kurd tê wateya çareserkirina hemû dozên Rojhilata Navîn û têkçûna zihniyeta netew dewlet ku bi sedan sal in hegemoniya xwe li ser herêmê ferz kiriye.
Bi rêbaza tecrîda şidandî hewl didin îradeya gelên azad derb û bêdeng bikin. Lew re li dijî projeya demokratîkirina Kurdistanê û herêmê şer dikin û tecrîdê li ser Rêber Ocalan disepînin ku têkîliya wî ji gel qut bikin, nerîn û pêşniyarên wî yên çareseriyê bê wate bikin. Îzole di cewherê xwe de, teyisandina qirkirinê ye.